



BULTENA ÇANDINIYÊ

Her Ku Dolar Zêde Dibe Malîyeta Berhemên Rençberan jî Zêde Dibe!

- Wekî encama polîtîkayên çandiniyê yên pêkanînên neoliberal ên AKP'ê, Li Tirkîyeyê hema bêje cotkarên bêdeyn nemane. AKP li şûna deynên cotkaran wekî deynê cemaweriyê hesap bike, deynê wan taloq dike.
- Welatên cihanê ji ber şewba Covid 19 û qeyrana aborî, rençberên xwe diparêze û piştgiriya dide wan. Lê mixabin polîtîkayên piştgiriya cotkaran ên Tirkîyeyê pir kêmtir in. Welatê Rusya li dijî buhayê gubre, buhayê gubre bi sînor kir. Li aliyê din 750 milyon dolar piştgirî da cotkarên Hîndîstanê.
- Di sala 2021'an de gubre her meh zem bû. Di meha cotmehê de jî zem hat ser gubre. Bi zema nû re Gubreyê DAP'ê, ji 6700 tl derket 7200 tl yî. Gubreyê 20:20 jî ji 4400 tl derket 4800 tl yî.
- Li gorî daneyên TUİK'ê yên meha tebaxê, salane buhayê gubre ji sedî 66,71 zêde bûye. Buha gubre yê GUBRETAŞ'ê yê salane jî di navbera ji sedî 85 û ji sedî 140 de tê guhertin.
- Li Tirkîyeyê malîyeta hilberîna maddeyê tonek gubreyê ure û malîyeten din digêje 268 dolarî. Ev gubre ji bo rençberan bi 855 dolarî dibe mal. Tonek gubreyê Can 26 jî .i 130 dolarî dibe mal. Lê vî gubreyî bi 485 dolarî difiroşin rençberan.
- Maddeya herî girîng a gubreyê Azotê amonyak e. Serê hilberîna tonê ya herêmî 282 dolar/ton e. Buha gubre amonyaka îthal jî 590 dolar e. Li Tirkîyeyê kapasîteya hilberîna gubreyê amonyakê li gorî şîrketan tê guhertin. Gubreyê Gemlikê 363 hezar ton, Gubreyê ÎGDAŞ'ê 396 hezar ton, yê Etî Bakirê 75 hezar ton, bi giştî 834 hezar ton e.
- Komeleya Xwedîkirina Hemû Sewalên Şîr û Goşt (Tusedad) bi daxuyaniyekê aşkere kir ku Konseya Şîr a Navneteweyî (USK) buhayê şîrê xaf 3,20 TL diyar kiriye. Li gorî vê yekê hilberîner zerar dike û divê lîtreya şîr bi 3,90 tl bê firotin.
- Banga Zîraatê ku wekî banka cotkar û rençberan hat avakirin, lê niha bûye banka hevkar. Bankayê 300 milyar dolar kredî da Yildirim Demîrorenê. Zevî li hemberî 1 milyar û 118 milyon lîrayî îpotek kirin. Lê ev zevî dîsa paşve dan Holdînga Demîrorenê.

Jiyan Her Diçe Buha Dibe


- Li gorî FAO'yê, buhayê Xurekê Kurevî mehane ji sedî 3 zêde dibe. Salê ji sedî 31,3 buha bûye. Li gorî hesabên TUİK'ê enflasyona meha cotmehê derket 2,39, salane jî derket 19,89'an. Endeksa Buha gubre Serfxur a ENAGrupê di meha cotmehê de ji sedî 6,90 zêde bû. Di 12 mehan de jî ji sedî 49,87 zêde bû.
- Li gorî TUİK'ê zêdebûna xurekan a di sala dawî de; Hêk ji sedî 70, Frengî ji sedî 70 Mirîşk ji sedî 69, Kartol ji sedî 58, Rûnê Gulberojan ji sedî 52, Nîsk ji sedî 50, Margarîn ji sedî 50, Nok ji sedî 42 Arvanê garis i sedî 40, Şîr Penêr û Mast ji sedî 34-35, Salam-Sucuk-Sosis ji sedî 35-38, masî ji sedî 30, Miqarna ji sedî 28,5, Nan ji sedî 28, Goştê Ga ji sedî 25 zêde bûye.
- Li gorî TUİK'ê hilberîna nebat û zad li gorî salek berê de ji sedî 12 û hilberîna zerzewat ji de ji sedî 0,2 kêmtir bibe.
- Li gorî vê yekê di sala 2021'an de tê texmînkirin ku; qeysa hilberîna berhemên nebatan tê texmînkirin ku 62,7 milyon ton, qeysa hilberîna zerzewatan 31,1 milyon ton û qeysa hilberîna fêkî û baharatan jî 24,7 milyon ton be.
- Li gorî xebata Şîrketa Lêkolîna Metropollan a Nabza Tirkîyeyê ya Cotmeha 2021'an kesên tev li xebatê bûne ji sedî 84,5 diyar dikin ku de jiyan bêtir buha bibe û enflasyon zêde bibe.

2022 YILI 1 KG BUĞDAY ÜRETİM MALİYETİ

TOHUM	₺ 105,00
GÜBRE	₺ 540,00
ZİRAİ İLAÇ VE YAPRAK GÜBRESİ	₺ 105,00
MAZOT	₺ 50,00
TARLA KİRASİ	₺ 280,00
HASAT VE NAKLİYE	₺ 60,00
ARA TOPLAM	₺1.140,00
GENEL GİDER VE AMORTİSMAN % 5	₺ 57,00
FİNANSMAN GİDERİ %5,25	₺ 59,85
1 DEKAR BUĞDAYIN TOPLAM MALİYETİ	₺1.256,85
ORTALAMA BUĞDAY VERİMİ KG/DA (2020 TMO VERİSİ)	296,00
1 KG BUĞDAYIN ÜRETİM MALİYETİ	₺ 4,25

referansên bloomberght

berhemên çandiniyê yên demsalî di cotmehê de



•Buhayê hin berhemên demsalî

Berhem Kg	Mêrsîn Zevî	Mêrsîn Hal	Mêrsîn Dezgeh	Stenbol Hal	Stenbol Manav
Îsot	1-5 TL	2-10 TL	12- 18TL	3-12 TL	10-20 TL
Lîmon	0,75-3 TL	2-5 TL	5-8 TL	3-6 TL	9-15TL
Bihok	0,75-3 TL	2-5TL	8-15TL	5-8 TL	8-12TL
Burokolî	0,75-5 TL	2 -8 TL	6-10 TL	5-8 TL	20-35 TL
Firengî	0,50-7 TL	1,5-10 TL	7-15TL	6-15 TL	10-25TL
Spinax	0,50- 3TL	1,50 -4 TL	7-12 TL	1-4TL	8-15 TL
Karnabahr	0,50- 4TL	2-5 TL	14-17 TL	5-6 TL	15-25TL
Sêv	0,50-4	1,50-5 TL	7-17 TL	5-10 TL	10-15 TL

ÛNYA GÛNÛ
/TLAMALARI

ËGLENCÊLÎ
BİLGİLER VE
ENEL KÛLTÛR

Qeyrana Avhewayê Bandora Neyînî Li Hilberîna Çandiniyê dike!

"Rêxistina Meteorolojiyê ya Cîhanê (WMO) di rapora dawî ya meha Cotmehê de, hişyar kir ku guhertina avhewayê dê di asta kurevî de bandorê li ser qeyrana avê bike." Rêxistina Meteorolojiyê ya Cîhanê (WMO) li gorî rapora aşkere kir, di sala 2018'an de li cîhanê 3 mîlyar û 600 hezar mirov bi zahmetî xwe gîhandin çavkaniyên avê. Li gorî WMO'yê qeyrana avhewayê dê di siberojê de bibe sedema qeyrana avê. Ji ber vê qeyranê dê di sala 2050'an de 5 mîlyar mirov bi zahmetî xwe bigînin çavkaniyên avê.

BIRYAR A ME YE:
Em ê yan krîzê yan jî jiyanê bidin rawestandî?



Krîza avhewayê li her derê cîhanê bi awayekî cuda tê hîskirin. Tiştê tê xuyakirin ew e ku ger em tedbîrên ku guhertina avhewayê bide rawestandî negirin, dê krîz û karesat hîn zêdetir bin.

bugday

01

Pergala belavkirin û hilberîna xurekan li ser krîza avhewayê, krîza avhewayê jî li ser pirsgrêka ewlehiya xurekan bandorê dike.

Her sal li gelemperîya cîhanê 3 mîlyon ton jehriyên zeviyan li gel qirêjkirina ax, av û hewayê û xirakirina tenduristiya me, asta krîza avhewayê jî bilintir dike.

Bi bikaranîna sotemeniya fosîl, gubre û pestîsîtan ên jî bo hilberîna zexîreyan; jî ber sewalkariya endustrîyel û xebatên lojîstîk, di xebata çandiniyê de para belavbûna xaza serayan digêje ji sedî 30'an.



02

Gihîştina me ya xurekan û ava şêrîn (ava teze) di bin talukeyan de ne.


Pergala xurek û çandiniyê ku li gel jî birçîbûn û ne tê xwarîne re nabe çareserî, bandora xwe li ser krîza avhewayê dike û dibe sedema guhertina rewşên hewayê, nexweşiyên sewbê û berbelavbûna kêzikan. Ev bûyer jî dibin sedema kêmbûna ava teze û xurekan. Bandora vê yekê li herêmê xizanan zêde ye û bi xwe re bêedaletiya xurekan diafirîne.



03

Ji ber sedema hişkesalî û avdayîna serûber, her roj asta ava binerdê kêmîtir dibin, qadên avên ku zindewarên cuda di nav xwe de di hewînîna zuha dibin û pirrengiya biyolojîk tune dibin

Ji ber hişkesalîya zêde û bagerên diwar bi hezaran mirov neçar man çî û warên xwe terk bikin. Ji ber koçberiya domdar, li bajaran hejmara nifusê û bêkariyê her tim zêde dibin. Ketina asta halxwesiyê, bêkari û pirsgrêkên aborî-çivakî ku jî ber koçberiyê diqewimin, zemîn jî pevçûnan re amade dike.





Karesatên xeternak zêde dibin.

Guhertina avhewayê bandora xwe li ser çerxa avê dibe û li gelek herêman ji ber barana nişkava û zêde lehî radibin. Lehî canên mirovan dixê nav xeterevê, zirarê dide zeviyan û dibe sedema kêmbûna pirrengiyên bîvolojîk.



Hişkesaliya ku ji ber guhertina avhewayê pêk tê, rê li ber şewat û bêdaristanbûnê vedike. Ev rewş hem tê wateya kêmbûna daqurtandina karbonê hem jî tê wateya zêdebûn û belavbûna karbonê.



Li gorî mirovên zanar ji bo avhewayê hê jî hêvî heye.

Rêva çareseriyê: di hilberîna enerjî, çandî û çûvînhatinê de kêmkirina karbonê, hilberîna enerjîyê, astengkirina bêdaristanbûnê ya bi tedbîrên ku divê hikûmet bigire, arastebûyîna şirketan a hilberîna teknolojiya ku zirarê nade xwezayê û enerjîyên ku xwe nû dikin, tercîhkirina mirovan a hilberînên ku zirarê nade xwezayê, derbas dibe.



#JiboAvhewayêBihev



©MetinYoksu/YeşilGazete

Veguherîn; bi armanca domandina jîyanê bi temamî yek e, aboriya hilberînê esas digirtin, xwezayê ne wek çavkanî wek hebû dîtin, çanda bi xwezayê re di nav hevsgirîyê de jiyîn, pêkan e.

